Çawa bi awayekî rast maskeya sûretê li ber bikin

Maskeyên sûretê divê bi awayekî rast bên liberkirin da ku belavbûna vîrus û bakteriyan li we û kesên din bê astengkirin.

1. Destên xwe bişon an jî paqijkera dest bi kar bînin beriya liberkirina maskeya sûretê
2. Lê binêrin ka kîjan aliyê pêş ê maskeyê ye. Ji bo maskeyên sûretê yên yekcarî, ew piranî hêla rengîn e
3. Bi rêya girtina bi girêkên guh ên elastîk maskeya sûretê li ber bikin Baş piştrast bin ku maske li ser sûretê we zexm rûniştibe û dev û bêvila we girtibe
4. Dema bikaranînê destên xwe nedin maskeyê. Pir caran wê biguherînin û hertim yeke nû bidin ber sûretê xwe eger ew ter an jî qirêj bûbe
5. Bi rêya girtina bi girêkên guh ên kêşkî maskeyê derxînin, û wê zûka bi dûr xînin. Maskeyên sûretê yên qumaş bixin nav kîsikekî û wan di 60 dereceyan de bişon. Maskeyeke sûretê bi tenê carekê bi kar bînin, û piştre wê bi dûr bixin an jî bişon
6. Piştî bikaranînê destên xwe bişon an jî paqijkerên dest bi kar bînin

Maskeyeke sûretê ya çawa divê ez li ber bikim?

Cure I a maskeya sûretê dê we û kesên din biparêze. Maskeyeke sûretê ya bi marqeya-CE ya yekcarî ku li fabrîqeyê çêkirî bi kar bînin eger hûn tûş bûne an jî xwedî metirsiya pêketinê ya bi koronavîrusa nû ne, eger hûn maskeya sûretê bi kar tînin ji ber ku hûn di bin metirsiya bilind de ne, an jî hûn ê li gel mirovekî xwedî metirsiya bilind bimînin.

Di rewşên din de, hûn dikarin maskeyeke sûretê ya qumaş a baş li ber bikin wek dewsa maskeya sûretê ya yekcarî.

08.09.2020

Bikaranîna maskeya sûretê

ya li qadên gişt î

Di rewşên jêr de maskeyeke sûretê bi kar bînin

Eger hûn tûş bûne an jî di nav metirsiya tûşbûna bi koronavîrusa nû de bin û mecbûr mane ku ji malê derkevin, wek mînak ji ber ku pêwîstiya we bi testkirinê çêbûye

Eger hûn bi veguhastina giştî seyahatê dikin

Eger hûn di bin metirsiya bilind a nexweşiyê ya ji COVID-19ê de bin û dikevin nav rewşên wisa ku hem ji bo we û hem jî ji bo kesên din pêkanîna dûrmayîna ji mesafeya 2 metreyan dijwar e, wek mînak li navendeke kirîn û standinê, li şahîyekê an jî li çalakiyeke çandî

Eger hûn kesekî xwedî metirsiya bilind ziyaret dikin, yekî wisa ku hûn pê re najîn, wek mînak kesek li aramxaneyê, maskeya sûretê li ber bikin eger hûn nikarin li dûrahiya kêmtirîn 2 metre bisekinin, wek mînak eger ew kes pêwîstî bi xwedankirin an jî miqatebûnê bibîne

Di nav girseyên mezin de, wek mînak çalakî û meş, ku li wan deran dibe ku parastina mesafeyê dijwar be

Hertim maskeyeke sûretê li bal xwe amade bikin, lewre dema ku pêwîst kir hûn dikarin li ber bikin. Hertim hewl bidin ku rênîşanên giştî bişopînin: dema hûn nexweş bin li malê bimînin, bi mesafeya 1 an 2 metre ji kesên din dûr bisekinin û paqijiya baş pêk bînin – heta dema hûn maskeyê li ber dikin jî.

Kî ji liberkirina maskeya sûretê ya di veguhastina gîştî de awarte ye?

Wek rêgez, maskeyên sûretê tenê divê ji hêla kesên ku dikarin wan li ber bikin û derxînin bê liberkirin û divê bi awayekî pihêt li ser sûretê cih bibe.

Mirovên li jêr ji liberkirina maskeya sûretê ya di veguhastina gîştî de dikarin awarte bin:

- Zarokên jêr 12 salî
- Mirovên ku zehmetiya bêhnkişandinê dikişînin, ên xwedî astên kêm ên hişmendiyê ne an jî mirovên xwedî kêmasiyên fîzîkî an jî derûnî ku astengiyên wan ên derxistina maskeya sûretê hene
- Mirovên ku xwedî aciziyên berbiçav in di liberkirina maskeyê de

Bila di bîra we de be ku ji bo libernekirina maskeya sûretê dibe sedemeke derbasdar a mirovekî hebe, û ew sebeb dibe ku hertim xuya neke.

Maskeya sûretê dibe bê derxistin wek mînak dema hûn tiştekî dixwin an jî vedixwin, dema bi mirovekî ku bi lêvan dixwîne re diaxivin û bi sedema diyarkirina nasnameyê, wek mînak ji hêla polîs ve.

Bêtir agahiyan bixwînin di navnîşana www.sst.dk/en/English/Corona-eng/Face-masks de an jî bi xeta telefonê ya jimareya 70 20 02 33 ya hikumeta Danîmarkî